BEŞA YEKEMÎN
ERDNÎGARÎ

LI SER ERDNÎGARIYA RAMYARÎ Û SÎNORAN

Welatê Kurdan, ji 500 000 Km2 yî pêk tê. Rûpîvana xaka nîştiman, tantiroskî wekî Fransa ango wekî tevahiya Kalîforniya û New York'ê ye (Nexşe 1).



Nexşe 1. *Hevrûkirina rûpîvana çend Welatên Ewrupaya Rojava û Kurdistanê*

Kurdistana ku di ser sînorê Bakurê Rojhilata Navîn ya çiyayî re berz dibe, herêmê ji Yekîtiya Sovyetan ya berê vediqetîne. Erdnîgariya Kurdistanê, şaxên ku dirêjî Zerya Spî û Kendava Besrayê dibin û cihê ku şaxên wê lê digihêjin hev ber bi Kafkasyayê ve dirûvê “V”yekê vaj dide (Nexşe 2).



Di roja me ya îroyîn de ji ber ku ne xwediyên dewleteke serbixwe ne, Kurdistan wekî cihên ku zêdetirîn nîjada Kurdan li wan dijîn tê pênasandin. Kurd, li başûr bi ereban (Taziyan),li rojhilat bi Farsan(Îraniyan) û li rojava bi Tirkan re, di Rojhilata Navîn de bi sê komenîjadên mezin re xwediyê sînorên stratejîk in. Ligel van nîjadên cîran, li cihûwarên cîranên Kurdan, li bakur Gurcî(tevî Lazan) û Ermenî, li bakurê rojhilat Azerî û li başûrê rojava jî wekî Tirkmenan, mezin-biçûk gelek komenîjadên din jî dijîn
(Nexşe3).

Herêmên ku bi piranî Kurd lê dijîn, di dîrokê de her û her guherbar bûne. Herêma ku têkildarî Kurdistanê û di bin bandora Kurdan de, wekî girêdayî mercên gelhejmarî (Demografîk) dîrokî û aborî, her çendî ku fereh bûye ew çend jî biçûk bûye (nexşe 4)

.

Bi koç û mişextîkirinan, şîtelên(analîzên) berfereh di der barê biyekbûn(entegrasyon) û pişaftinê de, di bin serenavê Erdnîgariya Beşerî de hatiye dayîn. Cihê ku dikeve bakurê Kurdistanê,û di Tirkiyeya îroyîn de ku bi awayekî kevneşopî wekî axa E rmeniyan tê binavkirin û bakurê peravên Gola Wanê dorpêç dike,hema hema di nîvekê jê de Kurd dijîn.

Li aliyên din di navbera sedsalên 9 û 16'an de, axa kurdan ya ku li rojava bûye, wekî Pontus, Kapadokya, Kommagene û Kilîkyaya rojhilat, merhale bi merhale ji alî Yewnanên Bîzansî, Aramiyên Sûriyeyî, û bi dûv re jî ji aliyê Tirkmen û Tirkan ve hate bidesxistin. Lê ev meyl, di sedsala ku em têde ne de, dest bi zîvirîna ber bi vajî ve kiri ye.
Koça Kurdan ya giran ber bi bakurê rojava ve û dîsan guherînên ku Kurdan derbas kirin, ku wekî encam zîvirîn gelinan din, nemaze jî zîvirîna Lûriyan, ji herêma Kermanşahê ku dikeve başûrê Zagrosên Kurdistanê, heta ku dirêjî Tengava Hurmiz û pêştir dibe, herêmeke wê ya fereh P.Z.di serê sedsala 9'an de bi awayekî bi merhale û bêyî ku bi paş de bizîvirin hatiye winda kirin. Pêvajoya pişaftinê di roja me ya îroyîn de jî didome û ev rewş, bo nimûne ku hîn jî axaftina wan ya zaravayekî Kurdî(*bnr.ziman: Lakî)* û tevî ku diperisin oleke Kurdî*(bnr.ol:Yarîsanî)* jî,dikarin di nav Lakiyên ku pêwendiyên wan yên xurt bi Lûriyên cîran re hene de bêne xuyakirin*(bnr. Nexşe 3).*

Cudatiya di navbera Kurdan û nîjadên cîranên wan de,herî zêde di Başûrê Kurdistanê,yanê xeta ku cîranên wan yên Lûr lê dijîn Hemedan,Kirmanşah û Îlam de xumamî dibe.Ji sedsala 16'an û bi vir de,du herêmên cihûwarên mezin yên Kurdan ku(bi riya mişextîkirinê) ji parçeyên bingehîn hatin qetandin,li Kurdistana Navendî hatin zêdekirin. Herêma cihûwarbûna Anatolya Navîn Yunak a ku (Qada Frigya Magna ya kevn) dikeve başûrê paytexta Tirkiyeyê, bajarên Haymana, Cîhanbeylî û dorhêlên wan digire nava xwe. Sînorên wê herêma ku ber bi herêma bakurê Anatolya Navîn ya çiyayî ve dirêj dibe(Axa Pontusan ya berê),di tejaneya(Havza) *Yeşilırmak*ê de bajarên *Tokat,Yozgat,Çorum* û *Amasya* pêk te.
Di vî parçeyê bakurê Anatolya Navîn ku di roja me ya îroyîn de bi lezgînî fereh dibe de,ji cihûwarên Anatolya Navîn ya kevn bêhtir Kurd dijîn.Ku em herêmine pir biçûk ku bi Dimilî dipeyivin nexin nav,niha Kurdên ku li vir dijîn,ewên ku heta sedsala 9'an(Ku Bîzansî ketin herêmê) li vir bûn berdewamiya Kurdên Pontus in.
Herêma bicihbûnê ya Bakurê Xoresanê ku li bajarên Quçan û Bucnûrdê li Rojhilatê Îranê giran bû, bi taybetî di navbera sedsalên 16-18'an de,di encama mişextîkirin û meskenyarbûnên li Îranê pêk dihatin derketin holê.Bi dû Şerê Cîhanê yê yekemîn de,ji Kurdistanê beşa herî mezin(%43) li Tirkiyeyê,(%31) li Îranê,(%18) li Iraqê(%6) li Sûriyeyê û weke Yekîtiya Sovyetan ya berê di navbera 5 welatan de hate dabeşkirin(*bnr.Dîroka Nûjen).*Van welatan jî axa Kurdistanê di nav xwe de weke herêmên jêrîn û li bajaran dabeş kirine.

NOT

Navê Kurdstana Dîrokî, tenê li Rojavayê Îranê bi binavkirinek terabebûyî be jî, ku paytexta wê Senandaj e, di herêma "Kordestan"de hatiye parastin.Sedemek ji yên ku seriyan tevlîhev dike û balkêş; dabeşkirina Kurdîstanê ya di navbera welatên ku lê û blokên hêzên jeopolitîk de ew e ku; Kurdistan xwedî çar kûşaxên deman e(ku herêma Kurdan ya li Tirkmenîstanê jî tev lê bibe,ev hêjmar derdikeve 5'an).Parzemîna Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ku 5 caran li Kurdistanê ye jî xwediyê çar kûşaxên deman e.Ji hêla erdnîgarî ve Kurdistan,saeta ku 3 saetan li pêş ya Greenwich-Ingilîstanê ye,weke yek kûşaxên demê bi awayekî têkûz lê tê.Kûşaxên demê yên 3 saet û resen,ji bo qada di navbera radeyên 35 û 50'yan ku dikeve rojhilatê Greenwichê de tê pênasandin.

Kurdistana ku dikeve navbera radeyên (dereceyên) 36 û 49,bi sînorên xwe yên rojhilat û rojava li gorî dora xwe bi awayekî sirûştî pêwîste di kûşaxeke demê de hilê.

NEXŞEKIRINA BELAVBÛNA KURDAN YA ERDNÎGARÎ

Her wekî ku di mijara nasname û hebûna Kurdan a neteweyî de tê xuyakirin, cihên ku bi gelemperî Kurd lê dijîn jî her demê bûne mijara nîqaşan. Komenîjadên cîran, bi taybetî yên ku di derawaya birêveber de, cihên ku bi zêdebûn Kurd li wan dijîn her demê ji rastiya wan kêmtir dane xuyakirin. Kurd bi xwe jî di van herêman de di meyla pirolekirinê de ne. Vê rewşê bi awayekî xwezayî xebatên lêkolînerên ku biyaniyên herêmê ne binbandor kiriye.

Ya ku mirovan dibehitîne ew e ku, nexşekirina modîneya axa Kurdan ne dijwar e.Ji bo peyandinek bi vî awayî mêjerek zêde daneyên kevn, nû bi ewle û ji destên yekem hene.Di sedsala derbasbûyî û nîveka vê sedsalê ya pêşîn de,gelek lêkolînerên bi ewle û enstîtu,nijneyên berfereh di der barê hozên Kurdan ku li quncikên Kurdistanê yên cûr bi cûr dijîn,cihên biwarbûna wan,belavbûn û hejmara wan de amade kirine(*bnr.li hozan).*Peyandina nexşekirina nijne û heljimariyan jî hatiye kirin.Mînakek ji van ya herî baş eve ku,Komela Erdnîgarî ya Keyaniya Brîtanya(*Britis Royal Geographical Society)*,bi navê nexşeya nîjadên herêmê derxistiye ye.Ev nexşeya gelhejmarî(etnografik)bi serenavê(1906)Rojavayê Îranê,Sûriye û beşa Rojhilatê Tirkiyeyê,bi awayekî ku mirov ne li bende be Kurdîstanê navend digire.

Li ser vê nexşeya bi nirx,di roja me ya îroyîn de tenê guhertinin biçûk ji bilî ku di Şerê Cîhanê yê yekemîn de,ji holêrakirina Ermeniyan ji dorhêla Bêrma Wanê û ji cihên cûr bi cûr yên Rojhilatê Anatolyayê têrkar e.Çavkaniyek din ya ku pêwîste ji aliyê her kesên ku lê geriyane belavbûna Kurdan nexşe bikin were dîtin jî,ewên ku di Şerê Cîhanê yê duyemîn de ji aliyê Awusturyayê ve bi serenavê *Weltkarte,Sondera usgabe:wolkstum* hatiye weşandin.Li ser têkelbûna nîjadên Cîhanê nexşeya bi nirx ya rêzîn e.Ev nexşeyên ku di asta gundan de di derbarê têkelbûna nîjadî de zanistê dihewînin,di pîvana 1:1 000 000 de ye, û ji bo herêmên Kurdan bi rêzkirina Sedên çavkaniyan hatiye destek-kirin.

Di salên bi 1960'an de, bi navê Lêgerînên Envanterên Gundan Li ser pêşnumayekê dest bi xebatan kiribû. Lê ev xebat piştî sala 1967'an di nêvî de hatiye birîn û lêgerîn,di derbarê têkelbûna nîjadî ya Tirkiyeyê de di asta gundan de gelek zanistan dihewîne.

Nestmann di xebatek xwe ya taxeya daneyan de(Di Komara Tirkiyeyê de komên nîjadan- Ethnic Grups in the Republic of Turkey, amadekarê ji bo weşanê P.Andrews 1989), heman daneyên envanterên gundan bi kar anîne û nexşeyeke bi ewle ya beşa Kurdîstanê ya qewmî ku li Tirkiyeyê dimîne derxistiye.

Daneyên di envanterê de nexşeya Anatolyayê ji aliyê Saziya ku li jorê bubû gotina mijarê Komela Erdnîgarî ya Keyaniya Brîtanyayê ve tê destek-kirin.

Cudatiya tenê ku mirovan dihêle matmayî ewe ku, herêma nîjada Kurdan ya ku di daneyên anvanterê de, ji ya ku ji aliyê Înilîzan ve di nexşeyê de hatiye destnîşankirin Mezintir e.

Dibe ku ev rewş encamên duçarmayînên Kurdan ên salên 1929-38'an ên weke Mişextîkirinên berfereh û bi cihkirinên bi darên zorê û di salên piştî van re jî pêkhatina şoreşa demogratîf ya Kurdan ku nedihate xwestin be jî.(Bnr. Mişextîkirin, bicihkirinên mecbûrî û demografî).

Buroya Erdnîgariyê ya Hêzên Çekdarên Îranê jî di sala 1940'an de pêşnûmayeke bi vî awayî daye meşandin û encam di Ferhenga Erdnîgarî ya Îranê ya deh cildî de (Geographical Dictionary of Îran, amadekarê ji bo weşanê A.Razmara.1949-1951)hatiye weşandin .Ev xebat di salên di pişt re ji alî Etlesa Gundan ya Îranê-Village Gazetteer of Îran(Navenda Heljimarê ya Îranê 1968-roja îroyîn) ve hatiye berdewamkirin.Mandeya Iraqê ya mêtingehiya Brîtanyayê û Mandeya Sûriyeyê ya Mêtingehîya Fransayê (Tevî Antakyaya ku bi dûv re ji

Tirkiyeyê re hate berdan Jî) ji bo ji nû ve sereraskirina sînoran û diyarkîna modîneya Kurdistanê di derbarê dahûrandina herêmê ya nîjadî de têra xwe dane kom kirine.

Di nexşeyên ku di salên bi 1960'an ji aliyê Rûsan ve hatibûn çêkirin de zanistên bingehîn yên bi vî awayî hatine bikaranîn û sînorên herêmên Kurdan hatine derxistin.

Ev xebat ji vir û pê de ji bo welatên din jî weke rêbaz pêk hatiye.Tew!Rêxistina Agahîstandinê ya Navendî (CIA) ya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê jî nexşeyeke herêmê weşandiye.

Ev materyalên Sovyetan yên têkûz ku di nexşeyên bi pîvanên 1:5 000 000 de têne destek-kirin,di berhemên Bruk,Narody Petedney Azii(1940) û Bruk û Apechenko,Atlas Narodov Mira (1964)de têne xuyakirin.jê û pê de ev her du xebat ji bo beşên Kurdistanê yên cûr bi cûr xwediyên zanistine gelhenasî (nüfus)ne jî.(Nexşe 5) .

Ji ber avaniya sêgoşeyî û dirêjbûna welêt,binavkirina Kurdistanê Li gorî pergala erdnîgarî ya weke "Bakur","Başûr" û hwd…ne hêsan e.Dema ku bi baldari li axa Kurdistanê ya ku dirûvê "V"yekê vaj dide bê nihêrîn ,ev dijwarî dê bi awayekî vekirî bête xuyakirin.Ev rewşa dijwar,piştî şerê cîhanê yê yekemîn,ji hêla pêkerên siyasî ku piştî parçebûna Kurdistanê ya di sala 1918'an de derketin holê bêhtir hate kûrkirin.Ji bidawîbûna şerê cîhanê yê yekemîn û bi vir de,Kurd ketine meyla sînorên navneteweyî ku cihûwarên wan yên bingehîn dabeş dikin;nemaze jî yên Kurdistanê.

Di heman demê de hêrsa Kurdan ya li dijî van sînorên navneteweyî û têkoşîna wan ya ji bo jiholêrakirina wan jî berhemên vê ne.Guhertina tenê ku Kurdan kiriye,di encama parçebûnê de beşa ku li Îranê maye wek"Kurdistana"Rojhilat,beşa Tirkiyeyê"Kurdistana"Bakur û beşa Iraqê jî weke"Kurdistana" Başûr bi navên aliyan ku li ser tê nîqaşkirin bi nav kirine.Ya ku Kurdîstan bi vê rêbazê li jêreherêman hatiye veqetandin rast e,lê navên kêmxistinî yên weke Kurdistana Tirkiyeyê,Îran û Iraqê,ku welathezek Kurd naxwaze van navlêkan bi kar bîne û pê hestên xwe têr bike cuda were girtin,ji bilî ku sînorên Tirkiye,Sûriye,Îran û Iraqê weke"de facto"bête pejirandin û parastina wan nayê tu wateyê.Binebeşkirin û navlêkirineke bi vî awayî di tu çandê de,di tu zimanzaniyêde,olî,aborî û dîrokî de ku ne beranberî binebeşkirineke bi vî awayî ye,ji vegotina rastiyeke erdnîgarî jî dûr e.

Li gorî vê rêbaza ku siyasî bûye,nêzî nîvê Kurdistana Îranê ku weke"Rojhilat"tê binavkirin,di rastiya wêjeya îroyîn de,dirêjbûna wê ya ku di seranserê Kurdistana Iraqê ku weke"Başûr"tê zanîn(Ya ku weke "Bakur"tê pejirandin)bi rastî Kurdistana Tirkiyeyê jî li rojavayê vê cih digire.Ev rêbaza çewt ku ji bo binebeşkirina ax û mirovên Kurdan hatiye bikaranîn,ji ber vê ye ku,di wêjeya ji aliyê Kurdan û di derbarê Kurdan de hatiye weşandin û bûye rêbaza herî gelerî,tenê ne xemgînî ye; di heman demê de îronîk e jî.Ji bo ku ev pergal neyê pejirandin û li şûna vê,têgihên ku bi awayekî hêsan têne fêmkirin û bi aqlî bêne bikaranîn gelek sedem hene.

BÊŞÊN XWEMAL YÊN KURDISTANÊ

Kurdistana Navendî,ji hêla dîrokî,civakî û çandî ve,dikare ji bo 9 beşên xwemal were veqetandin.Başûrê Rojhilat,Başûr,Navengî,Rojhilat,Bakur,Bakurê Rojhilat,Rojava,Bakurê Rojava,û Rojavayê Dûr yê Kurdistanê.Anatolyaya Navîn û Xoresan ku du cihûwarên xweser û mezin yên Kurdan in,ji ber ku du herêmên Kurdan yên ji Kurdistana Navendî ku Kurd lê dijîn qetayî ne,pêdivî bi senifandineke cuda tê dîtin.

Tevî ku ji Kurdistana Navendî bi awayekî fizîkî cudane jî,dîroka wan ya dirêj û serjimara wan ya zêde,dike ku bi neh beşên din re bi heman awayî bêne nirxandin(Nexşe 6).



Plan paş

Di derbarê du herêmên din ên Kurdistanê yên mezin û dîrokî de, di her yekê ji wan de, tomariyên ku bûne"Fosîl"û li demên homojenbûyîna nîjadî ya berî xwe rast tên hene. Di dabeşkirina zaravayên ku Kurd bi wan diaxivin de, di çanda wan ya aborî de, di hêmanên baweriya wan ya olî û di nêrîna wan ya Cîhanê de şopên van dabeşkirinên bingehîn yên berê têne xuyakirin. Sedemên parçebûnên îroyîn ango yên berî niha derketine holê, ango dahûranên berfereh, di derbarên destek-kirina pêkerên cuda de, ziman, ol, bajarbûyîn û navendên bajaran, Koçên Dîrokî, mişextîkirin û meskenyarbûnên bi kotekê, di van beşan de têne dîtin.

Koçên Kurdan yên B.Z. di derdora sedsala 3'yan de, ji Başûrê Rojhilat ber bi Bakurê Rojava ve dest pê kirine û li demeke fereh belav bûne, P.Z. ber bi dawiya sedsala 4'an ve,ji hêla çandî ve rê li ber homojenbûyîna civaka Kurd vekiriye.Bandora vê ya girîng û tekane eve ku heta niha li cem gel xwediyê nasnameya nîjadî êl,hoz dihatin dîtin,êdî li şûna vê weke nasnameya Kurd hatiye nasandin.

Lê belê tu homojenbûyîn di neteweyek weke Kurdan zindî de bi awayekî demdirêj ne pêkan e.Ev avaniya homojen, ji ber ku nîvê Kurdistanê yê ku li rojavayê Zapa Mezin dimîne, ji yê din çar sedsalan bi awayekî siyasî qetayî maye teribiye. Dema ku ev herêm ketin bin rêveberî ango bandora Bîzansiyan, beşên mayî bi awayekî bi biryar bi malbata Îslamê ve hatin girêdan(Bnr. *Dîroka Serdema Navîn).*Bandora yekem a vê dabeşbûyîna çandî ya kevn,bi şêweyê ku her du jî Zapa Mezin bingeh bigirin(*Ya ku di bin bandora Bîzansiyan de),*ya ku Anatolyaya Xiristiyan(*Ya ku di bin bandora Taziyan de)*,ji axa Îslamê bi aliyê Bakur û Başûr de vediqetîne,veqetandina Kurdî di nav komên zaravayên Pehlewî de weke Bakur-Başûr û di

şopandina vê ya veqetandina di nav koma zaravayên Kurmancî de weke Bakur-Başûr tê xuyakirin.
Sînorên ku di sedsala 16'an de li herêmên serweriya Şahînşahiyên Îran û Osmaniyan de hatine xêzkirin jî,weke sînorên kevn ku di navbera Misilman û Bîzansiyan de mayînde û sînorên ku Kurdan ji hev parçe dikin hatine fêmkirin.Encam,parçebûnek çar alî ku di roja me ya îroyîn de bi awayekî vekirî tê xuyakirin e.Xetek hê jî rêgeha giştî ya Zapa Mezin dişopîne,ya din ji Bêrma Ormiyeyê ber bi Başûr weke rastênheva sînorên Îran-Iraqa îroyîn ber bi Çemê Şîrvan/Diyala û di ber rêgeha xwe ya Başûr-Rojava re dirêjî şahrabanê dibe.Van pêkeran encamên dabeşbûna welêt li van beşên bingehîn yên jêrîn zayandine.

BAŞÛRÊ ROJHILATÊ KURDISTANÊ

Ev herêm ji hêla niştecihên xwe ve weke"Lakîstan"jî tê zanîn. Herêma ku ji hêla cotemeniyê ve derametar, hêjmarek zêde ya cotyaran di nav xwe de dihewîne. Tevî ku bavikên koçer di rabirdûyê de ji hêla ramyarî ve bi hêzbûn jî, tu carî serweriya civaka cotyar ku hîmê wê di kûrahiyê de ye pêk ne anîne. Ev dever, çawa ku jiyanê dide Başûr-Rojhilatê Kurdistanê, dilê Împeretoriya Medan jî bû. Bajarê Hemedanê ku paytexta Medan bû, hê jî bajarê navendî û herî mezin yê Başûr-Rojhilatê Kurdistanê ye. Bajar û bajarokên mîna Nehawend, Malayir û Tuîsîrkan weke cihên niştecihiyan kêfê didin herêmê.

Zimanê ku hema serjimêra herêmê bi giştî diaxive"Lakî"yê ku şêwezarekî zaravayê goranî yê Kurdî ye. Lê belê ya ku mirov li herêmê rastî kêmneteweyên mezin ku bi Farisî diaxivin were jî pêkane. Ev rewş bi giranî ji bûyera ku herêm ji sê aliyan ve ji hêla Farisî(Lûrî jî di nav de) ve hatiye dorpêçkirin tê kelijandin. Ev di heman katê de nîşaneya çanda serdest e jî. Di navbera herêma gotina mijarê û Kurdİstanê de, tenê di xaleke biçûk de girêdan heye. Ev sirûşta Başûr-Rojhilatê Kurdîstanê ku hatiye îzolekirin, ji bo binbandorbûna ji bayê pişaftinê yê hêdî lê bi bandor ku ji nêvenga dorpêçkirina Farisî/Lûrî tê hatiye rewşeke vekirî ku ev pêvajo di roja îroyîn de jî didome.
Tevî ku Îslama şiî di Başûr-Rojhilatê Kurdİstanê de civakeke ku çendî diçe mezin dibe û jê re rêz tê girtin pêk tîne jî, niştecihên herêmê bi gelemperî baweriyê bi ola Yarisanî tînin. Mirov dikare qala Yahûdiyên ku li herêmê kevn, lê çendî ku diçe kêm dibin jî bike.

Cihûwarên niştecihî yên vê herêma jêrîn ên mezin:Hemedan,Kengawar,Asadabad,Nehawend,Malayir,Berû Cerd û Tuîsîrkan in.Hemedan bajarê herêmê yê navendî ye.

BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

Başûrê Kurdistanê, herêma herî dawî ya serweriya şêwezarê Lakî yê zaravayê Goranî û navenda ola Yarisanî ye. Zaravayê Kurdî yê Kurmanciya Başûr î belavbûyî(Kelhûrî),li vêde zimanekî ku ji hêla hindikayiyek biçûk ve ji Farisiya ne niştecihî jî kêmtir tê axaftin e.
Goranî û şêwezarê wî yê Lakî, Pehlî/Feylî û Hewramanî di herêmê de tekane bloka zimên pêk tînin. Li vê herêma ku bajarvanî bi têrî tê de bi pêş ketiye, mirovên kozmopolît dijîn. Gelê niştecih xwedî hişmendiyek xurt ya dîrokî ye, û di rastiyê de ji ber ku di seranseriya pênc sed salên dawîn de bi çanda Fars re di nav dan û standinê de bûn,jê binbandor bûne.

Ev herêma jêrin wekî din, dibe ku weke Başûr û Bakur rojhilatê Kurdistanê were veqetandin. Herêma duyemîn, ya ku ji Hemedan ber bi Başûr ve dirêj dibe, axa Lakistanê ye.

Li vê herêma jêrîn cihûwarên nîştecihî yên girîng:Kirmanşah,Harûnabad(Şahabad),Îlam ,Qesrî Şîrîn,Xaneqîn,Pahla,Mindalî û Barda ne.Bajarê Kirmanşahê Li vê herêmê bajarê mezintirîn û navendî ye.

ROJHİLATÊ KURDÎSTANÊ

Beşek mezîn ji yê Rojhilatê Kurdistanê,bi taybetî jî beşa ku dikeve başûrê tevereya (eksen) Bicar-Merîvan,heta demek nêzîk jî ji hêla çandî ve beşek Başûrê Kurdistanê bû.
Di roja îroyîn de li vê deverê Kurmanciya Başûr zimanek tenê ye.Îslama sûnî jî li vê deverê ola piraniyê ye.
Mirovên çolterî ku xwedî rabirdûyek koçerî ne,vekirî biyaniyên mirovên bajara ne,û ev rewş civakek ku xwedî kesayetiyek du alî diafirîne.Bajarên mîna senendeş,Bicar û Merîwan ku xwedî kesayetiyek vekirî û nerm ya çanda Başûrê Kurdistanê ne,qadên çolterî girtî û xwedî kesayetiyên hişk in.Sedema bi binketina gelek partiyên politîk ku li vê deverê têne damezirandin ew e ku nikarin alîgiran ji van her du beşên civaka niştecih bibînin.Çavkaniya besta çandî ya herêmê bi awayekî berbiçav Îran e.Lê belê pêwendî ,nemaze ji bo mirovên çolterî,ji pêwendiyên ku bi başûr ango bi Başûr-Rojavayê Kurdistanê re hatine danîn ne bi hêztirin.
Di nav van warên niştecihî yên girîng li vê herêmê de,Senendeş,Biçar,Bûkan,Serdeşt,Şîno,û Merîwan hene.Bajarê Mehabadê navenda vê herêmê ye(Nexşe 7).

NÎVENDA KURDISTANÊ

Meyla beşa navengî her demê ber bi Mezopotamya ve bûye,û dîroka wê jî bi vê herêmê ve girêdayî ye.Rabirdûyek wê ya bajarwanî Mîna ya cîranê wê Başûrê Kurdistanê heye.Belê avhewa û erdnîgariya wê ne weke ya Başûrê Kurdistanê ye.Beşa Navengî beşa herî kêm çiya,û xwedî germahiya herî bilind ya Kurdistanê ye.Bi rastî jî ev herêm herî zêde weke germiyan tê binavkirin.
Lê belê ji hêla çandî ve, tevî ku Başûrê Kurdistanê pêncsed salan ji hêla Farsan ve hatiye birêvebirin jî,beşa Başûr û navengî ji gelek hêlan ve mîna ku berdewamiyên hev in.Berî parçebûna Îran-Osmaniyan,ji dîroka nivîskî û bi vir de,meyla Başûrê Kurdistanê ji hêla çandê ve herdem ber bi Mezopotamya de bûye.Di demeke zû weke B.Z. di 2300'an de,di Sumer û Başûrê Kurdistanê de dan û standinên giran yên çandî,teknolojîkî û di navbera xanedaniyan de zewac bûne gotina mijarê(Bnr.Dîroka Kevnare).Tevî ku di Kurdistana Navengî de ola piraniyê Îslama Sûnî ye jî,lêrasthatina civakên mezin mîna Şiî,Yarîsan,Elewî Êzidî,Xiristyan û Yahûdî jî pêkan e.
Bi vê ve girêdayî, tevî ku zaravayê Kurmanciya Başûr(Soranî) bi hêze jî,bi hemû zaravayên Kurdî yên mezin jî li vê deverê tê axaftin û weke ku ji hêla çandî ve tê xuyakirin,ji hêla erdnîgarî ve jî di navbera hemû herêmên Kurdan de xaçerêbûna xwe dixe holê.

Warên niştecihiyê yên girîng li vê herêmê:Hewlêr,Koy Senceq,Kerkûk,Silêmanî,Rewanduz,,Kifra û Kehor in.Bajarê Hewlêrê navenda vê herêmê ye.

ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

Rojavayê Kurdistanê herêma herî mezin a welêt û ya ku ji gelek hêlan ve zêdetirîn pirteşebûyînê di nav xwe de dihewîne ye.Serjimar bi awayekî gelemperî Îslama Sûnî ye.Lê belê di herêmê de kêmahiyek mezin ya Elewiyan û lêrasthatina kêmnetewene din yên mîna

Xiristyan û Yahûdiyan jî gengaz e.Piraniya Sûnî ku weke ziman Kurmanciya Bakur diaxivin,Dimilî zimanê piraniya Elewîyan e.Serjimara Xiristyan ligel Kurmancî bi zaravayên mîna Suryanî û Neo-Aramî diaxivin.Lê zimanê Ermenî,zimanê kêmahiyek pir biçûk e ku li şûna Ermeniyên ku demekê li herêmê xwediyê serjimarek mezin bûn mane.

Li gel ku Rojavayê Kurdistanê weke erdnîgarî ji deştên Mêrdîn û Rihayê,û ji rêzeherêminan çiyayî ku dikevin bakurê Madenê û bilindahiya wan bi ser 3000 metreyan dikeve pêk tê jî bi pîvaneke mezin xwedî bergeheke Zerya Spî ye.Li tevahiya herêmê avhewa nerm,cotemenî derametar û hê jî gelek lodên daristanan li ser lingan in.Rojavayê Kurdistanê ku di dîrokê de şaristanî bû ye,gelek bajarên wê yên mezin her demê xwedî serjimarên pir û bi cîhana devreyî re xwedî pêwendî,çavkaniya îlhama xwe te divê ji Antakya,te divê ji Roma û te divê jî ji Bîzansiyan ango bila ji Stenbolê be;berê wê her demê li Zerya Spî û li Rojava bûye.Li gel ku bi Bakurê Kurdistanê re xwedî sînorek dirêj e jî Rojavayê Kurdistanê di kardariyê de ji vêde û bi rastî ji nîvek Başûr-Rojhilatê Kurdistanê bi tevahî qut e.

Ev rewş bi giranî ji ber avaniya Başûr-Rojhilatê Kurdistanê ya bi kurtik û mesîl û xalîbûna wê tê kelijandin.Ji ber biçûkbûna xala ku Rojavayê Kurdistanê û beşa Navengî li bakurê Mûsilê digihîne hev,ev veqetîn xurtir dibe.Bi awayek watedar di sedsala 19'an û serê sedsala 20'an de tevahiya bizavên netweyî û germ ku li Rojavayê Kurdistanê dest pê kiribûn,ligel ku bi hev re di bin serweriya Osmaniyan de bûn û tevî ku sînorên navneteweyî ku wan bisekinînin tune bûn jî,tu carê cîranên derdorê li beşa Navengî(Kurdistana Iraqê ya dahatuyê) belav nebûne.

Bi rastî jî belavbûna bizava Şêx Ubeydulah ya di salên 1880'yan de ku sînorê Bakurê Kurdistanê yê di bin rêveberiya Osmaniyan de derbas kir û li Bakurê Kurdistanê ya di bin rêveberiya Îranê de belav bû ji belavbûna Rojavayê Kurdistanê û beşa Navengî ku di bin rêveberiya heman Osmaniyan de bû hêsantir hate dîtin.Ji bo vê bizavê derbaskirina sînorên di navbera Împeretoriyên Îran-Osmaniyan de,ji yên di nav Kurdan de û mêjînî hêsantir bûye.

Di vê beşa bingehîn de bajarên mîna Êlih, Cizîr, Mêrdîn, Qamişlo, Dihok, Zaxo, Sêrt, Farqîn, Siwêreg û Riha hene. Amed li vê beşê bajarê mezintirîn û navendî ye.

ROJAVAYÊ DÛR Ê KURDİSTANÊ

Rojavayê dûr di nihêrîna yekem de mîna berdewamiya Rojava ku di ber seranserê perava rojavayê Feratî re dirêj dibe tê xuyakirin.Mixabin ev yek tenê ji alî bergehê ve wisan e;yekirina van her du beşan xeletî ye.Weke dîrokî ev dever,cihûwarên Kurdan ku di Serdema Kevnare û Klasîk de bi komagene û Kapadokya Magna têne bibîranîn in,û hin herêmên Rojhilatê Klîkya jî parçeyek vê beşê ye.

Tekane xala Kurdistana Navendî ku vedibe Zeryayên vekirî li vê beşê ye.Bendera Peyasê ku dikeve Kendava Îskenderûnê ya Zerya Spî,tekane bendera Kurdistana ku hemû aliyên wê bi bejahiyê dorpêçkirî û çiyayî ye.Êla Kurd î navdar a bi navê Canpolat,ji Serdema Navîn û bi vir de,li herêmên perava dorhêla Bayaşê dijîn.

Dirêjahiya giştî ya vê herêmê ji cihê ku çemê Ferat û Murad digihêjê hev dest pê dike.Niçika wê ya herî Başûr,digihêje mezintirîn Kela Kurdan ya ku serê wê li Sûriye yê dinihêre,û jêmayiyên wê ji aliyê Bakur-rojhilat berbi Başûr-rojava ve dirêjî nava Amanosan dibe.

Bilindahiya van çiyayan ji Bakur-rojhilat ber bi Başur-rojava ve çendî diçe dikeve.Di vê herêma ku ji hêla daristan û çêregehan ve dewlemend de,berhemên cotemeniyê yên Sereke riwekên Zerya Spî yî û berhemên ajalî ne.

Li herêmê ziman,hema hema bi giştî Kurmanciya Bakur tê axaftin.Çawa ku ola piraniyê Îslama Sunî ye Li vêde kêmahiyek mezin a Elewiyan bi qasî %35 jî dijî.Heta sed û pencî sal

beriya niha jî,herêma ku ji Kilîs dirêjî Efrîn,Îslahiye,Bahraş û Bayaşê dibe û tevahiya axa ku li Zerya Spî dinihêre,di bin Serweriya Êzidiyan debû.
Di encama komkujî û tehdeyên ku piştî vê serdemê hatin beşek mezin ji Kurdên Êzidî tune bûn,gelek ji wan jî reviyan Împeretoriya Rûsya,bi dûv re jî bapîrtiya Kurdên Êzidî yên di Komara Ermenistanê ya nûjen de pêk anîn.
Hebûna Kurdan a li peravên Kendava Îskenderûnê ne nû ne jî bûyereke dembori ye.
Ji bapîrên xwe yên Hûrî û bi vir de ,Kurd li dorhêla peravên Kendava Îskenderûnê yî çiyayî,li wargehên mîna Antakya,Îskenderûn ,û Edeneyê jiya ne.
Di demên cûr bi cûr de,erdên wan carcaran yan gihane heta peravê,yan jî heta rêzeçiyayên mîna Masî û Nûrheqê vekişiyaye û ji zeryayê ber bi hundir de tenê çen km'yan bi dûr keti ye.
Dema ku nivîskarê Romayî Plîny ê mezin hozên kurdan yên ku P.Z.di sedsala 1'ê de rêz dike,gelek hozên mîna Belîkan û Bahraşê ev 1900 salin hê jî li heman herêmê dijîn .
Tevî ku parçeyên hundirîn jî di nav de,Rojavayê Dûr yê Kurdistanê ,bi şêweyê jiyana çandî ,û ji hêla avhewa û berhemê wê ve bi tevayî taybetiyên Zerya Spî pêşkêş dike.
Dîsa jî li vê herêmê jiyaneke ku bi koçeriyê ve girêdayî hatiye meşandin(û tê meşandin).Di hêjmara 22'yê avrêla 1854'an ya rojnameya The lll ustrated London News de,di nivîsara dirêj ku bi ser wêneyên Mama Kara Fatma yên ku ketina wê ya bajêr didan xuyakirin û neji ber,ku tevî hoza xwe hatibû Stenbolê;da ku bi Osmaniyan re tev li şerê tev kujiyê bibe hatibû vekirin de , "Em tê gihiştin ku Fatma ji bajarê Mereş ku li Kurdistanê ye hatiye"tê gotin(Bnr.Cihê jinê û jiyana malbatê).
Ev herêm ku heta bixwazî xwedî serjimarek pir e,bi hebûna bajarên xwe yên mezin û kevnare dipesine.Li herêmê jêmayiyên gelek bajarên şûnewar û bi bandor,û kevne şopiyek dirêj û berbiçav ya jiyana bajarvaniyê heye.Bajarên mezin yên vê herêmê:Meletî,Semsûr,Dîlok ,Islahiye ,Kilîs,Efrîn û gurgum in.
Bajarê Samsat ango Samosata yê dîrokî ku li perava çemê Feratê û paytextê keyaniya kurdan ya Serdema kevnare Komagene û cihê ji dayik bûna Şair Lûcian e,di sala 1991'ê de di ava gola Bendava Ataturk de bi xeniqînê re rûbirû hatiye hiştin.
Li şûna Samsat bajarekî din yê navendî hêdî lê bi gavên bi biryar bi Royavayê Dûr yê Kurdistanê ve dibe yek.Ev bajar xwedî serjimarek giran û Edene ye.
Lehiya Kurdan ku ji herêmên çiyayî di herike û nayê sekinandin demografiya bajêr ya nîjadî bi Lezgini diguhere û werdigerîne bajarekî Kurdan.Dîtina bajarê Edene yê ya weke bajarekî Kurdan hê ji niha ve(1999)pêkan e.Bajarê Meletî yê kevnare ku xwedî dîrokek ji 3000 salan zêdetir e,bajarê sereke yê herêmê ye.

BAKURÊ ROJAVAYÊ KURDÎSTANÊ

Navenda vê herêma jêrîn Dêrsim,ku di navbera çemên Ferat û Mûradê de ye.Herêma ku di navbera zivistanên hişk û havînên hênik de guherbar,xwedî cotemeniyek dewlemend e,û bi qasî ku zozan û daristanên wê gengaz dike bi awayekî têrkar berf û baranê distine.
Baniyên wê yên mîna çiyayên Munzûrê ku ji 3500 metreyan bilintir,di ber seranaeriya perava Başûrê Ferêt re ji rojhilat ber bi rojava ve dirêj dibe,hestiyên pişta vê herêmê pêk tîne.
Piraniyek mezin ya serjimara Elewiyan ku ji Îslama Sunî bi çend qatan zêdetir,zaravayê Dimilî diaxivin.Di serdema kevnare de herêm weke "Derzene"ango"Derxene"dihate zanin.Bi dûv re ji ber niştecihên,weke "Dilaman"hatiye binavkirin.
Bi sedema ku ji ola Elewî bû,Bakur-rojavayê Kurdistanê bi Tirkmenên Elewî yên li Bakur-rojavayê xwe re têkiliyên nêzîk danîne.Hêza leşkerên kizilbaş yên resen î rizgarker ku xanedaniya Safewî li Îranê aniye ser text(Di wê serdemê de ev herêm jî digirte nava xwe) ji vê herêmê derketiye.Di salên dawîn de li rojava û li Tirkiyeyê ji bo ku vê herêma Kurdistanê ya kevnare ku xwedî baweriya Elewî ne û Dimilî daxivin,di serê wan de zanaveke cuda biafirînin,ji Kurdistanê biqetînin û li vê deverê"Zazaîstan"ekê ava bikin gelek hewldan pêk hatine.Bê goman e ku mebesta wan ji vê,tunekirina bizava neteweyî ya Kurdên li Tirkiyeyê ye;ew nebe jî bi kêmanî lawazkirina wê ye.

Çewlig(Çebexçûr),Elezîz(Xerpêt),Erzîngan,Tercan,û Îmranli,bajarên girîng yên vê herêmê ne.Navenda wê,bajarê Dêrsim e.

BAKURÊ KURDISTANÊ

Bakurê Kurdistanê,ji Kurdistana Navendî beşa herî dijwar,ya herî bêhtir xwedî mercên xwezayî û avhewayî ku nayên kişandin û ya herî bêhtir xwedî sirûştek bi kurtik û mesîl e.Wekî din di vê herêma ku bi bilindahiya xwe ya nîvekî herêma bilintirîn e de,gelek baniyên ku ji 3500 metreyan bilintir hene.Di zozanên bilind yên herêmê de,tenê di çend mehên salê de berf tune ye.Beşek mezin ji ya pergala çeman ku bi baranên xurt têne xwedîkirin,li herêmê bêyî ku bêne bikaranîn diherikin û diçin.Hema hema tevahiya Gola Wanê di vê herêma Kurdistanê de dimîne.

Ev herêma çiyayî, tenê li aliyên Rojava û Bakur-Rojava,di hin newalan de destûrê dide cotemeniyên bi pîvanên mezin û li van deran dihêle bajarên mezin derkevin holê.Ji hêla din ve,herêm ji hêla şêwazê jiyana koçerî ve bi tena serê xwe qada herî derametar diafirîne.Herêm bi vê rewşa xwe bi hezarên salan e ku bûye kela Kurdan a koçeriyê.
Nîveka rojava a vê beşa ku demekê xwe di sektorek cotemeniya bi hêz,aboriyek ku pişta xwe dida bazirganiyek bajarvaniya navendî bû,ligel komkujî û mişextîkirin,şerên şahînşahiyan ku li pêncsed salên dawîn belav bubû,di encama tehdedayîna derdorê de hatiye kavilkirin(Bnr.Dîroka dûr Nûjen û Ax û Derdor).Niştecihên herêmê ber bi hundirîn,êpê eşîretî û di Kurdistanê de ji hêla teknolojî û aborî ve koma herî li paş mayî pêk tîne.

Bakurê Kurdistanê di paşerojê de ji bo gelek navendên çandî yên mezin malevanî kiriye.Bedlîs cihê jidayîkbûna yekem dîrokvanê Kurd û nivîskarê Şerefnameyê Pismîr Şerafedînê Bedlîsî ye.Bajarên mîna Wan,Ormiye,Selmas,Culemêrg,Xelat û Mûş,bi hezarên salan nebin jî bi Sedên salane ku bûne navendên niştecihiyê yên ku serjimarên boşayî di nava xwe de dihewînin.Belê tevahiya wan,ji sedsala 16’an û bi vir de duçarî bêmirovkirin û hilweşandinê bûne,û di seranseriya Şerê Cîhanê yê yekemîn de bi piranî hatine kavilkirin.Hin ji van bajaran,piştî pêvajoyek 75 salî ya lipaşmayînê ancex di demên dawîn de xwe bi ser hev de anîne.Wan di van demên dawîn de bajarê herî boşayî û li herêmê di rewşa navendî de ye.Wana ku koça gundiyan ya di heft salên dawîn de ji ber mercên şer ji beşên çolterî reviyan girte xwe taybetiya navendî bûyînê ji destên Ormiye girtiye.

BAKURÊ ROJHİLATÊ KURDISTANÊ

Beşek mezin ji ya vê herêma jêrîn,nemaze jî Bakur-Rojhilatê Bêrma Wanê,Ermenîstana dîrokî ye.Beşek pir mezin ji xisletê xwe yê Kurdî, piştî bidawîbûna Şerê Cîhanê yê yekemîn bi dest xistiye.Tevî ku Bazîd di herêmê de bajarê mezintirîne jî,gotina mîna”Ev dever bajarê navendî “Dilê”yê herêmê ye”pir ne rast e.Ya rastî li vê deverê tu bajarên din yên hêjayî tomariyê jî tune ne.
Lê belê jêmayiyên gelek bajaran hene.Bajarekî mîna Bazîd(Bazîda rojhilat ya nûjen) biçûk jî,demekê bajarekî mezin û navenda çandê bû. Nivîskarê destana neteweyî ya Mem û Zîn û helbestvanek Kurd ji yên herî navdar ku Ahmedê Xanî ye,vê herêmê gihandiye(Bnr.Wêje).

Sedema bidestxistina derawaya îroyîn a Bakur-Rojhilatê Kurdistanê,hilweşandina ku heman derawa bi Bakurê Kurdistanê jî daye bidestxistin e.Ji ber kêm kurtik û mesîlbûna xaka

vê herêmê û xwezaya wê ya vekirî,dilbijîna heman hêzên tarî yên ku Bakurê Kurdistanê ya cîran rûxandine zêde bilind kiriye.Çawa be ax derametar e û hem ya ku bi têrî baranê distîne hem jî ji ber ku xwedî pergaleke boşayî ya çeman e,xwedî nehêniyên avê ya dewlemend e.Ji ber sedema ku gelek cihûwarên herêmê hê jî xwedî boşayiyek nizim ya serjimariyê ne,bipêşketina cotemeniya herêmê ya zêde asteng dike. Hema hema serjimar bi giştî Kurmanciya Bakur diaxive;lê belê lêrasthatina hin komên biçûk ku li Rojava û Bakur-Rojava Dimilî diaxivin jî gengaz e.Li niçika herî bakur ya herêmê,ligel ku serjimara herêma di navbera Qers û Erdexanê de dimîne ji kêmahiyek bi hêz ya Elewiyan pêk tê jî ola piraniyê Îslama Sûnî ye.
Xoresan,Erdexan,Mako,Agirî,Qaxizman,Milazgir,Gimgim û Xinis cih û warên vê herêma jêrîn in.Bajarê Bazîdê navenda herêmê ye.

HERÊMA XORESANÊ YA NIŞTECIHIYÊ

Herêma Xoresanê ya li Bakur-Rojhilatê Îranê ku ji du beşên cihûwarên Kurdan yên bê pêwendî yek ji wan e,bi hebûna xwe ya îroyîn deyndarê mişextîkirinên Kurdan yên di navbera sedsalên 16-18'an de ji hêla "Şah"îtiya Safewî ve ku bi giranî ji Bakur û Rojavayê Kurdistanê ne. Cihwara Xoresanê ya ku bi pîvaneke şaşker mezin xwedî serjimarek ew qas pire ku,"Weke qad"ev herêma ku hema hema bi qasî beşa Kurdistanê ya li Sûriyeyê bi car û nîvekê bêhtir (weke 2 milyon) Kurd li nava xwe dihewîne,gelek kesên Kurd û ne Kurd şaşwaz dike.

Dîrokvanên sedsalên 17 û 18'an ku ji beşa Xoresanê re bi awayekî çewt tenê gotine "Kurdistan" dibe ku ji vê bûyera şaşker hatibe kelijandin.Kurdên Xoresanê li vê herêmê rêveberiyên xwe yên xwedî dîroka cotemenî û destkariyek pir bi bandor damezirandine,û heta nîvê sedsala 19'an li dijî rêveberiya Îranê ya navendî li ber xwe dane.
Belê berevajî baweriyek belavbûyî,tiştê ku yekem car hatina Kurdan ya vê herêmê pêk aniye,ne meskenyariyên Safewiyan yên bi kotek in.Ji demên gelekî kevn û bi vir de Kurdên koçer bi awayekî bi merhale gihane vê derê û bi awayekî bi pergal li çiyayên Bakurê Xoresanê bi cih bûne,
Ji vê civaka Kurdan ku bi domana demê re hatine pişaftin û bi paş de tenê tomariyên dîroka wan ya paşerojê mane.Ya ku Safewiyan bi awayekî girseyî Kurd mişextî Xoresanê kirin,her çendî ku ne tenê pêkerek cuda bû,ew çend jî bûyerek bê pergal û ji nişka ve ciriya bû.Cihwara Xoresanê ji sala 1886'an û bi vir de,di navbera Komara Tirkmenîstan(Berê Şahînşahiya Rûs,paşê jî SSCB) û Îranê de hatiye dabeşkirin.Beşa herêmê ya ku li Tirkmenîstanê maye,herêma çiyayî ya ku li paytext Aşkabadê dinihêre digire.Derdora vê herêmê ya xwezayî ku xwedî avhewayek hênik e,li gorî Bakurê Kurdistanê kêmtir hatiye rûxandin,û li gorî bodîneya wê bi qasî ku nayê biçûkirin bajar(Quçan,Şîrvan,Bajnurd jî di nav de) û qadên cotemeniya wê yên derametar hene.Wekî din dîroka wê ya van her çend sedsalên dawîn,ji ya Bakurê Kurdistanê ku ji hêla piraniyek mezin ji ya niştecihên herêmê hatibû dest jê berdan kêmtir bi aloze.Ji ber ku serdema mişextîbûna wan li destpêka rûxandina leşkerî ya Împeretoriyên Îranî û Osmaniyan ku li Bakurê Kurdistanê bi awayekî tirsehêz didomiya rast dihat,civaka Kurdên Xoresanê, kevneşopiyek ku di welatê wan yê resen de wenda bûye,di roja me ya îroyîn de hê jî diparêzin.

Kevneşopiyên nermtir yên van Kurdan û cil û bergên wan yên rengareng ger ku rûxandinên gotina mijarê jiyan nekiribana,di babeta ku dê Bakurê Kurdistanê bi çi awayîbana de dê ramanên girîng dabana nifşên pêşerojê.Cihên ku ji piraniyek mezin yên Kurdên Xoresana Nûjen re çavkanîtî dikirin ev cih bûn.Weke encam,hema hema Kurdên Xoresanê bi giştî, weke Kurdên Anatolyayê Kurmanciya Bakur diaxivin. Pejirandina ola Şiîtî û Elewîtiyê

ku van Kurdan di sedsala 16'an, dema mişextîbûnê de kirin, berjengeke dîrokî ku Rojava û Bakurê Kurdistanê bi rêjeyek mezin Elewî bûn dide xuyakirin.
Çendî ku dîrokvanê Kurd Şerefxanê Bedlîsî beşek mezin ji hozên Kurd weke Êzidî dabin nasandin jî, ya rastî bi vêna ola Yezdanî ku Elewîtiyê jî digire nava xwe, tuwane dike(Bnr.ol:Yezdanîtî).Kurdên Xoresanê tenê ne ji bo ku Xanedaniya Ozbek ya Asya Navîn bi dewleta Îranê ve girêdin,lê di heman demê de,ji bo ku di rêwingiya Hindistanê de bi qralê Afşar ê Îranê Nadir re rêhevaltiyê bikin jî hejmarek zêde leşker dane.Nadirê ku bi xwe Tirkmenekî sûnî bû, bi qasî 50 000 Kurdên sûnî ji Xoresanê kom kiriye, û vanan di têkçûna fermandarê Hindistanê Mughalsê Mezin û dagiriya Delhiyê de wejnek grîng lîstine tê tomarkirin.Bersivdayîna di destpêkê de, di nav Kurdên Xoresanê de çiqas sûnî hebûn,ne hêsan e.Bi Sedên salane ku duçarî bandora civaka Îranê ya Şiî ne, ji ber ku nêzî bajarê Şiîyan yê pîroz Meşhedê ne,û ji ber ku hejmarek kêm mirovên bawermendên sûnîtiyê li herêmên cûr bi cûr belav bûne,Xoresan aniye rewşa civakek ku ji têkiliya Elewî û misilmanên sûnî pêk tê.
Cihwara Xoresanê,di heman demê de,ji civakên biçûk yên mîna Kurdên Yarîsan ku bi devokê Lakî diaxivin re jî malovaniyê dike.
Ev Kurd, ên ku di sedsala 18'an de, di dema xanedaniya Şahîtiya Îranê ya Afşarî de ji Başûrê Kurdistanê mişextî vê deverê hatine kirin in. Bi rastî Kerîm Xanê damezrînerê Prensiya Zend ya Îranê ku li şûna Xanedaniya Afşarî hatibû damezirandin bi xwe jî ji êlek ku pêgirê mişextiyên Lakî ye(Êla Zend) tê. Piştî ku Kerîm derket ser textê Teyrê Tawiz,gelek ji mirovên xwe vegerandine welatê wan yê kevn.Yên ku mayîna li wir pejirandine,bapîrên Lakên Nûjen yên li Xoresanê û Bîrcandên li Qohîstanê ne.

Bajarên navendî yên li Xoresanê:Şîrvan,Bocnurd,Samalqan,Radkan,Dar,Gaz,Kelat,Bajgiran û Fîrûza ne.Navenda herêmê Quçan e(Nexşe 8).

CİHWARÊ ANATOLYA NAVÎN

Ev beş li Anatolya û pişka nîveka bakurê Anatolyayê herêmeke du beş û du xisletî ye.Beşa başûr ji cihwarên mezin yên mîna Cîhanbeylî,Yunak û Haymanayê pêk tê û li herêmeke bejî ku ji cihwariyê re ne guncan û li rojavayê Gola xwê dimîne(Başûrê Enqereyê) hatiye avakirin.
Û Beşa Bakur,berevajî vê,qeraxên wê yên ku bajarên Tokat,Yozgat,Çorum û Amasya pêk tînin,herêma Pontus ya çîyayî ku xwedî serjimarek pir,ji cotemeniyê re guncan û lakêşeyekê bibîr tîne digire.Ligel ku bajarên Tokat û Yozgat hê ne xwediyên piraniya Serjimara Kurdane jî,xala herî girîng ya beşa bakur pêk tînin.
Amasya,yanê Amasea serdama kevnare,ji du paytextên Keyaniya Pontus ku B.Z.di navbera sedsalên 4 û 1'ê de daraz kiriye weke yekî ji wan peywîr kiriye(Bnr.Dîroka Kevnare).Pêwîste bajarê Kirşehîrê ku serjimarek mezin ya Kurdan dihewîne û bi giştî di ber seranseriya peravên Çemê Sor re dirêj dibe jî li van bajaran bê zêdekirin.
Cihê serdanî ya herî pîroz ya ola Elewîtiyê,yanê turbeya Hecî Bektaş li Başûr-rojhilatê Kirşehîrê ye.
Çawa ku derketina beşa başûr î holê,ji kelijandina meskenyariyên macbûrî ango ji mişextiyên ku di navbera sedsalên 16-18'an de civaka Kurdên Xoresanê jî afirandiye,Beşa Bakur,bêhtir ji encama koçên herdemî û xwezayî ku ji Kurdistana Navendî ber bi vê herêmê de bûne derketiye holê.Beşa Bakur ku dînamîk û bi xiroş e,di nav hemû Kurdan de,cihê ku reseniya jiyanê lê herî bilinde.û bi lezginî fereh dibe.Li gel ku piraniya mezin ya Kurdên li vê herêmê Kurmanciya Bakur diaxivin,dibe ku civatek derdora %10 jî zaravayê Dimilî diaxive.Baweriya niştecihên herêmê yên olî hema hema nêvî bi nêvî li Îslama Sûnî û Elewîtiyê dabeşkirî ye.

Her herêma mezin a Kurdistanê ku li jor qala wê hate kirin jî,di nava xwe de li herêmên biçûktir hatiye dabeşkirin,û bi awayeki ne fermî ku xwedî hîmên dîrokî ne,ji hêla birêxistin bûyînên rêze eşîr û malbatên mezin-biçûk ku êpê dişibin yên li Îrlanda û Îskoçyayê ve têne birêvebirin.
Ji ber ku rêveberiya Kurdistanek serbixwe tune ye,serweriya eşîret û herêman,bi awayeki kevneşopi(weke ku li Îrlandayê beriya serxwebûnê),weke yekîneyên Kurdan yên birêvebir û neteweyî tev digerin.
Ev şixulîn digihêje hîmên çawa ku di rêveberiyên dewletên nûjên de tê dîtin herêm ango bajaran.Çawa be ji,dîsa weke ku li Îrlandayê,ev yekîne hemû,di bin sîwana “Rêveberiya hozan”de li ser rastiyên dîrokî,çandî û civakî ku têne rêzkirin bilind dibin(Bnr.Rêveberiya hozan)(Nexşe 9)

BEŞA DUYEMÎN

AVANIYA XAKÊ Û DERDOR

XAK:

Taybetiya jeofizîk a herî kartêker ya Kurdistanê, bê gomane ku ew herêmeke çiyayî ye. Di roja me ya îroyîn de Kurdistan weke hîm, ji nîveka Zagrosan pişka bakur,ji sê paran du ji çiyayên Toros û Pontusan, beşa rojhilat û herêmek ku Çiyayên Amanosan pişka bakur digire pêk tê. Xoresana ku ji du beşên mezin ên cihwarên Kurdan ku pêwendiyên wan bi beşên din re tune ne yek ji wan e,dikeve Girê Rîvanda ku dikeve pişka rojhilatê Çiyayên Elbrûzê ya herêma Bakurê Îranê, a din jî dikeve nîveka Çiyayên Pontus ku dikevin nîvend û bakurê Anatolyayê,cîranê paytexta Tirkiye Enqereyê ye (Nexşe 10).

Ligel van,bi sedên salan e ku ji girên agirî yên Belûcistana Rojava heta pişka nîvenda Çiyayên Elbrûz ên li bakurê Îranê,li herêmên ku direjî Çiyayên bilind ên li peravên Egeyê ku dikevin rojavayê Tirkiyeyê,gelek cihwarên Kurdan hatine avakirin.
Li cihwarên din yên Kurdan ku li gelek qadên dûr belav bûne,mîna xaka Kurdistanê ya bingehîn,çiyayên tekane û bûyerên xwezayî ên girîngin,dîroka Kurdan,gel,çand û kevneşopên wan şêwandine.
Xaka Kurdistanê li cihên ku deşt lê dest pê dikin bi dawî dibe.
Cihê ku nîvekî berztirîn Bakurê Kurdîstanê ye.Bi gotina William Eagleton,”ev dever welatê robarên ku dinirin,zixurên bi sî û pirên daleqandî ye.
Ji hêla din ve Kurdistana navengî jî,di nav Kurdistanê de,nîvekî cihê nizimtirîn û ya ku avhewaya wê germtirîn,û pir caran jî herêmeke hênik e. Herêmên din,di baweşêna navbera van her du niçikan de cih digirin.Çiyayên Kurdan penavên Îran û Anatolyayê bi dorê ji aliyên rojhilat û rojava ve mîna dîwarekî dorpêç dike, û vanan ji deştên rast ên Başûr-rojavayê Erebîstanê,li bakur jî ji tejaneya Zerya Reş vediqetîne.Rêze çiyayên ku li nîvendê,weke ku hestiyekî piştê î bi hêz pêk tîne,ji aliyekî heta aliyê din ê Kurdistanê dirêj dibe.
Xalên herî bilind ên Kurdistanê ev in:Çiyayê Elwend bi 3523 metre bilindahiya xwe li (Îran)Başûr,Çiyayê Halgurd(ango Algurd)bi 3674 metre bilindahiya xwe li Bakur-Nîvenda(Iraq) Kurdistanê,Çiyayê Mûnzur(Tirkiye) bi 3463 metre bilidahiya xwe û Çiyayê

Agirî(Tirkiye) bi 5165 metre bilindahiya xwe li Rojava ne (Nexşe 11).



ERDNASÎ

Kurdistan ji hêla erdnasî ve êpê çalak e.Weke herêmeke ku di navbera plaqeyên tektonîk yên Awrasya û Efrîqayê ku dikopişin hev re bi xwaro-marobûna bilindbûyî disekine. Weke cih,tebeqeya-biçûk ku ji plaqeya Ereban qeta ye,di bin plaqeyên biçûk ên Îran û Anatolyayê de salê bi lezek çend santîmetreyan xwetêdanê didomîne,û di encama vê de di xala ku Çiyayên Zagrosan û Kurdistan di kopişin hev de ji du hêlan ve ku dikeve bin pêkutîyê,her sal bi qasî çend santîmetreyan ber bi jor ve bilind dibe.

Ev kopişîna parzemînî ku berî niha bi 15 milyon sal dest pê kiribû,herêma ku Kurdistan tê de ye,ji binê Zeryaya Tetîs ku Başûr-Rojavayê Asyayê digirte nava xwe bi jor de dahfandiye,û alikariya wê ya ji bo bilindbûna Çiyayên Kurdistanê yên ciwan hê jî didome.Avaniya jeolojîk a quntarên Kurdistanê yên ku li dika Ereb dinihêre,weke hîm ku bêhtir dirêjî başûr dibe,bi tebeqeya ku jêmayîyek Zerya Tetîsê ya kevn ku di bin Kendava Besrayê de ku ji hêla hîdrokarbonê ve dewlemende re xwedîyê heman avaniya Xakê ye.
Ev avanî hema hema mîna ku qet nehatibe guhertin,ji Antakyaya ku li rojhilatê peravên Zerya Spî heta Tengava Hurmiz dirêj dibe.Ya rastî di wateya erdnasiyê de heta demek pir nêzîk yanê ji girêdana Okyanûsa Hindê bi Zerya Spî û Atlantîkê ve, hetanî veqetandina Awrasya ji Efrîqa û Erebîstanê,ava Kendava Besrayê li quntarên çiyayên Kurdistanê didan.

Yanê, tebeqeya erdnasiyî ya Kendava Besrayê ku petrolê di nava xwe de dihewîne,berdewamiya kanên dewlemend ên petrol û gaza xwezayî yên li Kurdistanê ye. Kanên gaz û Petrolê bi giştî hema hema eynî di sînorên xwaromarobûnê yên tektonîk de,yanê di xêza ku qadên çiyayî ji deştan vediqetînin de têne dîtin(Bnr.Kanên xwezayî:Neft).Dema bê fikirîn ku herêmên niştecihî ên Kurdan li cihên bidawîbûna çiyayan diqede(Bnr.pêkerê

neteweyî:çiyan),ev dewlemendiyên bin erdî(Bi taybetî li Iraqê)di ber sînorên nîjadî re dirêj dibe,û Kurdan ji civatê ne Kurd vediqetîne.
Wekî yek ji encama vêna,bo nimûne Kanên Petrolê ên Kerkûkê,Li Başur ji bin herêmên niştecihî ên Kurdan dest pê dike bi pêşketina ber bi Bakur-rojava ve di bin herêmên niştecihî yên Tirkmenan,bi dûv re dîsa ên Kurdan,bi dûv re ên Ereban,bi dûv re dîsa ên Kurdan,dîsa ên Tirkmenan,û herî dawî di bin ên Kurdan re derbas dibin(Bnr.Nexşe 41).

Lehiyên agirî ên mezin,li rûyên qadên mezin ên li Bakur û Bakur-Rojhilatê Kurdistanê ji nû ve derketine holê.Baniyên Agirî yên biçûk û mezin û Çiyayê Nemrûd ê li perava Gola Wanê,sê mînakên kopişker ên vê erdnasiya çalak in.Wekî din jî,her du golên Wan û Ormiye jî,li pêşiya kanên çeman,di demên erdnasî ên nêzîk de ,ji hêla lehiyên agirî ve di encama bend kêşînê de bi awayekî xwezayî çêbûne.

Pişka xakê ya mayî ku bi giştî xwaromaro ye,ji Kurdistanê,di bereka Bakur-rojava û Başûr-rojhilat de,lê belê bêhtir bi giranî jî,gelek xetên şikestî ku bi awayeki berbi çav ji rojavayê Kurdistanê di bereka rojhilat-rojavare bi pêş dikevin derbas dibin.Biserveçûnên volkanîk xaka Kurd bi kanên lajwerd ên ku ji hêla bazirganî ve xwedî nirxin dewlemend kiriye (Bnr.Çavkaniyên xwezayî).

Wekî din jî xweza,bi dewlemendî û pircûretiyek keviran visa tije û bi ser ve diçe ku,efsûn kirina serdankeran a di serdanên wan ê yekemîn de didomîne.

Ji hêla din ve,erdnasiya Kurdistanê ên şûnwarnasî kêm li ser lingan mane .Perestgeha Xwedawenda mezin Anahîta ku li Başûre Kurdistanê Kengawar dimîne ,govaniya telereşî ya van hêjînên domdar û qûşlêkirinê dike.

Sutûnên pekandî,pêlikên mezin ên parçebûyî,peron û dîwarên belav bûyî,nîşaneyên zindî yên van hejînên bê navber ên 2200 salî ne.Peykerên dêwasa ên parçebûyî ku li Çiyayê Nemrûd ku dikeve bakurê semsûrê ya li Rojavayê Kurdistanê jî mînakek din e.Wekî din,biwêja “Daqurtandina gund û bajaran ji hêla axê ve”ku di çîrok û serpêhatiyên gel de,vê livdariya erdnasî ku her didome destnîşan dike.

AVHEWA Û BARAN

Li Kurdistanê germahiya nîvekî ya salane, girêdayî bilindahiyê guherbariyek girîng dide xuyakirin,çendî ku bi herêmên çiyayî ve tê bijorketin germahî dikeve.Mehên havînê,li herêmên bilindahî nizim,ku bi radeyek fetîsok germ û nîv-hêwîtî pêkane,li herêmên nava çiyan hênikayiyek xweş çêdibe.
Demsala zivistanê,ji bilî herêmên biçûk ên marjînal ku li deştan dinihêrin,bi radeyeke cemedker sar û barîna berfê ye(Nexşe 12)



Asta vê dijberiya di avhewayê de,di encama tunekirina daristanan û çêregehên ku bi çêriyê têne rûxandin de,çendî diçe bilintir dibe.Çend qadên ku heta demek nêzîk avhewaya wan lihevker dihate zanîn,di roja me ya îroyîn de,çawa ku di navbera germa havînê û serma zivistanê de diçe û tê,wergeriyaye xakine nîv-qelaç û bê deramet. Hema hema herêmên herî sar ên ku germahiya nîvekî ya salane di bin xala cemidandinê de bi giştî li Bakurê Kurdistanê,pişka Anatolyayê ne,û ev rewş dike ku li herêmên bilind her dem qadên qeşayî bimînin .

Herêmên herî sar,ji Kurdistanê nêzîkî % 15'yan pêk tînin.Herêmên ku germahiya nîvekî ya salane li wan di navbera xala cemidîn û 5 'C (40'Fahrenheit) an de,ji Kurdistanê nêzikî %19'an pêk tîne.

Ev herêm weke hîm,ligel pişkên Bakurê Kurdistanê yên ku li Tirkiye û Îranê dimînin,ji du şaxên ku li Bakurê rojavayê Kurdistanê Dêrsim,ê din jî ji Başûr dirêjî heta Iraqê dibe pêk tê.Li van herêman ji salê 7 mehan dibe ku berf bibare.Bajarên Qers û Erdexanê di nava vê herêmê de cih distînin.

Li Bakurê Kurdistanê mehên zivistanê bi giştî ji Anchorage û jûneau yên ku li Alaskayê ne, sartir derbas dibin.Dema ku dîrokvanê Yewnanî Ksenophon û 10.000 Leşkerên Yewnanî di ser Kurdistanê re bi paş de dizîvirîn (B.Z.401),vegotinên govanên zindî yên di der barê şerê wan ku çawa di nava neçariyê de li hember sermayê, nêzîkî dused salan "rêwingiyên lucullus"ên Romoyiyan radigihandin ve jî têne destek –kirin. Ji vegotinên Plutarch ên weke "barîna berfa her kêlî, di rojên herî vekirî yên hewayê de jî barîna teyrokê û cemidîn ,bahoza domdar,hespên ku heta radeya dawîn westiyabûn û vexwarina wan a avê bi kotekî,û di encama şikestina qeşayan de ku lemlateyên hespan kelişîbûn û meşa wan a bi kotekî, tê fêmkirin ku wê salê demsala zivistanê di meha rezberê de dest pê kiriye (jiyan "lucullus").Di artêşa Roma de raperîn teqîyaye û artêş ji neçarî bi paş de zîviriye.Di dawîya Serdema Navîn de dema ku gerokê Venedîkî Marco Polo serma rave dikir,gotina "Hemû sînor derbas kirine"bi kar aniye (Ger û geşt.1.vî).

Beşên Bakurê Kurdistanê ên mayî ,beşa mezin a Rojava Rojhilatê Kurdistanê,eynî weke parçeyê biçûk ku ji Başûr dirêjî heta Hemedanê dibe,xwedî germahiya 15-10'C (40-48'F) nîvekiya salane ye.Ev nifşê avhewayê nêzikî % 20'ê Kurdistana navendî pêk tine.

Dêrsim,Bedlîs,Mûş,Çewlig,Agirî,Wan,Culemêrg,û Kela Diza,Bajar,Serdeşt,Merîwan,Banê,û Hemedan jî di vê nifşê de cih digirin.Gelek salan berf li van herêman nîvekî 5 mehan li erdê dimîne.
Beşa herî germ a Kurdistanê, çêdibe ya ku xwedî germahiya 10-15 ’C (47-58 ‘F) nîvekî ya salane,ya nifşê avhewayê ye.Ev nifşa ku bi tena serêxwe nifşa herî mezin ya avhewayê pêk tine,hema hema ji sê’ya du’yê Başûrê Kurdistanê,û nîvê Rojavayê Kurdistanê,yanê %40’ê Kurdistanê digire.Ev herêm bajarên mîna Meletî,Semsûr,Dîlok,Elezîz,Zaxo,Duhok,Amediye,Halebçe,Mehabad,Seqiz,Senendej,Kirman şah,Şahabad û Kengawar,û Qûçan,Bacnûrd,Şirwan(Li herêma Xorasan),û wekî din Cîhanbeyli,Haymana,Polatli,Yozgat û Tokat (Li komikên Anatolya) digire nava xwe (Bnr.Bajarîbûn û navendên bajaran).Demên van herêman ku di bin berfê de dimînin dibe ku bigihêje 4 mehan.
Nifşa herî germ a avhewaya li Kurdistanê xwedî 15-20 ‘C(57-65 ‘F) germahiya nîvekî ya salane ye.Kurdistana Suriyeyê bi giştî,nêvî ji Kurdistana Navengî ya ku li Iraqê dimîne,û nêzikî %15’yê Rojavayê Kurdistanê di vê nifşa avhewaya germ de cih digire.Bajarên mîna Amed,Sêrt,Mêrdîn,Riha,Qamişlo,Efrin,Sincar,Silêmani,Hewlêr,Qasrî Şirîn,Îlam,Gîlan û Pehla di vê nifşa avhewayê de cih digirin.
Di herêmên sînor ên di navbera Kurdistan û cîranên wê de,li herêmeke biçûk î deştî ku %10’ên rûpîvana Kurdistanê bi giştî kêmtire,germahiya nivekî ya salane derdora 20-25 ‘C(65-74 ‘F) ye.Ev herêm hema hema bi giştî li Kurdistana Iraqê dimîne.Ligel bajarên wekî Kerkûk,Kifra,Tûz Hurmatu,Xaneqîn,Mindalî,Bedra û Mehran,gelek ji baxên zeytûn,narinciye û hêjîran jî li vê herêmê ne.Li herêmê kêm caran berf dibare û zû radibe.Beravajî gelek herêmên Rojhilata Navîn,li Kurdîstanê baran bi pergal û pir e.Rejîmek avhewaya Zerya Spîyî ku zivistan û biharê baran lê derdikeve navserê serwer e.
Ev barana ku bêhtir weke berfê ye,li hin herêman dibe ku di seranseriya şeş mehên salê de bibare,û bibe sedema qeşayên domdar li baniyan.Demsala ku herî kêm şilî dibare havîn e;lê belê ji egera berfa ku li baniyan dihele robar dihihêjin leza herîkîna herî bilind,û ji bo avdanê bi radeyeke têrkar û bi ewle avê peyda dike(Bnr.Çakaniyên xwezayî:av)
Nîvekiya salane ya baranê ku li herêmên çîyan ê navendî 120-200 cm3 ye,li herêmên Kurdistanê yên bilindahî-nizim heta 50-100 cm3’yan dadikeve.
Herêmên ku herî kêm baranê digirin, herêmên deştî ku li Mezopotamyayê dinerin in(Nexşe 13).



DERDOR Û HAWÎRNASÎ

Rûberka rîvekî ya dewlemend li Kurdistanê ku di gelek fetlên avhewaya zuha û şil,di 100.000 salên dawin de derbas bûye,car caran bi pêş,carcaran bi paş ketiye û di xwezayî û dewlemendiya flora û faûna yên niştecihde guherînên tirsnak derketine holê.
Di dema herî bi bandor a serdema qeşayî ya dawîn de,ji ber sermaya domdar qadên fereh li herêmên bilind şewitîne,û qeşayî li gelek herêmên xalên bilind belav bûye.

Ji ber şemitîna nifşên avhewayê û herikînên hewayên germé ên ber bi başûr de, herêmên bilindahî nizim hindiktir baran standiye. Beriya 12 000 salan ku li Kurdistanê dest bi kedîkirina ajalan û tîmarkirina tovan hate kirin,hê jî mêjereke girîng herêmên qeşayî hebûn, ligel ku rejîma baranê ji roja me ya îroyîn cudatir bû,çerxa demsalan ya avhewayê têra xwe cuda bû.Taybetiya herî kopişker a pergala hawîrnasî ya vê demê eve ku,ligel rîvekên bi tovên pir dewlemend û kovî,bi çêregehên ku rîvekên bi pîvaz û kulîlkên din dihewîne pêçayî ye(Wright 1968.334-339). Her wekî mihên mezin ên kovî, keriyên bizin û berazan ên giyaxur û çiçikdar, keriyên çûkên koçber da ku ji van çavkaniyên xurik ên dewlemend sûd wergirin li van herêman jiyane.

Ev herêm ji bo vedîtina du teknolojiyên nû ku wê şoreş pêk bianiyana cihekî guncan bû. Cotemenî û kedîkirina ajalan,ji ber vê ye ku tevî xaka Kurdistanê, Mezopotamyaya Jêrîn û Sûriye-Filistîn bi navê “Hîvika bi adanî” derbasî dîrokê bûne(Bnr.Pêşketina teknolojîk ya zû).Gihaneka dawîn ya guherîna erdnasî û avhewayê, kişîna qeşayiyên mayî, bi paşde vegerîna germahiyê bi hemû hêza wê û ligel herikînên hewaya germ ber bi bakur ve ku ewrên bi baranê barkirî dixistin nava liv û lebatê,nêzikî 8 000 sal beriya niha dest pê kir.

Dema ku ber bi beriya niha nêzikî 6000 sal de dihate hatin, ev rejîma muson ya asyayê, di penava Îranê re xwe digihande heta rojhilatê Kurdistanê, û rê li ber gelek bêrmên hundirîn vekir. Vê rewşê bêhtir vekişîna qeşayiyan ber bi baniyan, jixwe van çiyayên ku demsalên zivistan û biharê bi têrî baran standibûn ,bû sedema barana demsala havînê û di encama vê yekê de rûberka rîvekî li quntarên çiyayan belav bû.Tûndirayên sar û çêregehên firk, destûr da ku daristanên bi serwîzad ,qaj, merx,deviyên rojhilat, çiqilên derve, hewr,çinar û ya herî girîng berû û şambelotan çêdibin. Li newalên bêhtir bi penah, qadên fereh ku ji darên mêwe û

bindeqan pêk dihatin hatin xuyakirin.Ajalên nû mîna hirçên boz û reş li van çiyayên nû dest bi zêdebûnê kirin. Di vê serdemê de herêmên bilintir wergeriyan çêregehan.

Musonên Asyayî ku beriya niha 4000 salan hêdî hêdî dîsan ber bi başûr ve vekişîn, bû sedem ku baranên havînî bi awayekî tund hatin birîn. Rûberka rîvekî li herêmên bilind yên Kurdistanê ev kêmbûyîna baranê, ku bi saya germahiya nîvekî ya nizim (Bi vê ve girêdayî jî rêjeya hilmbûyîna nizim) dikare xweşbîn be, herêmên nizim û newal di rewşeke pir qirofek de man.Penava Îrana cîran bi giştî wêran bû. Meyla hêdî û domdar ber bi hişkayiyê ve heta roja me ya îroyîn jî domiya ye. Beriya niha nêzikî 4000 sal pelgeyên ku bi destana Gilgamêş dest pê kirin û ji pelgedankên şaristaniyên Mezopotamya yên bi nivîsa bizmarî ku xwe gihandin roja me ya îroyîn bi giştî Zagrosê bi dirêjbûna hezarên kîlo metreyan bi her alî de daristanên serwîzadan teswîr dikin (Bnr.çanda gel û pêkerên neteweyî).Bi hev re xwe berdan kûrahiya daristanê û hatin çiyayên şîn. Li vê derê bi wî awayî man.

Zimanên wan hatin girtin.Bi wî awayî sekinîn, û li çiyayê ku bi darên serwîzadan pêçayî ku rûniştgeha yezdanan bû nihêrîn û man. Mezinbûna vê daristana serwîzad ku di ber çiyayan re dirêj dibe û diçe,siya mana derasayî ku bêxemiyê dide mirov,çiya û qadên vekirî bi şînahiya cihên bi qurs xemilîne (Ê ku wergerandiye û jibo weşanê amade kiriye :Sondars.Destana Gilgamêş,"Rêwîtiya Daristanê"1972).

Ev daristanên himbiz û tarî ji bo mirovên berê di çêkirina avaniyan,nanpêjên acûrî û bikaranîna rojane divê weke çavkaniyek ku qetandin lê tune be hatibe dîtin.Lê belê ev çavkanî hate qedandin.Raste ku,B.Z.dema hatina serê hezarsala yekemîn,Çiyayên Zagros ên serwîzadan(Sedir),bi awayekî hatine qedandin(Ango bûne goriyên guherînên avhewayî) ku,versiyonên destanê yên bi dûv re,ligel dijberiya erdnigarî ya vekirî,"Daristanên Serwîzadan" di vê demê de li van deran ,ku hê jî bi awayekî têrkar qol ên nirxdar têne hilberîn Îsnadî Libnanê tê kirin.Ya rastîn hinek lêkolinerên nûjen ku ev veqetînên erdnîgarî dîtibûn lê ji ber ku ji demek dirêj û bi vir de daristanên serwîzadî li Zagrosan ne hatine dîtin,serên wan tevlihev bûne û navê "Daristana Serwîzadî" ê ku di destanê de weke "Daristana Qajî"şîrove kirin û ketin nava meyleke bi vî awayî.Sumernas S.N. Kramer"Herêma ku weke Welatê serwîzadan tê nasandin rojava yanê Lubnanê destnîşan nake berevajî vê destnîşankirina rojhilat "angaşt dike.Ji ber ku yezdanê rojê Ûtû,di wêjeya Sumeriyan de,weke yezdanê ku ji "Welatê Serwîzadan û rîvekên bîhnxweş"zaye tê pênasandin(Kramer 1963:281).

Dema hatina serdema Ahameniyan ku giredayî modeya demê a kevneşopiya avêtina beştên taqê ji dara Serwîzadê mabûn (B.Z.550).Kurdistan êdî di rewşeke ku nikaribû vê pêdiviyê pêşwazî bike de bû.Qralê Ahamenî Darîûs ê 1'emîn,Serwîzadên ku dê di avakirina qesrên Sûsa û Persepolîste bihatana bikaranîn ji Libnanê dane anîn.Serwîzada Libnanê ku bextê Serwîzada Kurdistanê parve kiribû jî ji xwe dirêj najot.

Gelek daristanên Kurdan,ên ku di dîrokê de,ji avhawayên hênik mabûn in û dema ku bi pîvaneke mezin bêne birîn,careke din ne xwedî behreyeke xwe nû bike ye.Dema ku daristan yek carê ji binî ve were birîn,avhewaya biçûk û pergala erdê ku diparêze,bi giştî dibe hilm (Tune dibe).Bi wateya ne kêm a peyvê, di sûdwergirtin û pêvajoya bikaranîna van daristanên ku çavkaniyên xwenûkirinê di wan de tune ne de,heta ji mirovan bê,pêwîste bi pûtayî tev bigerin.Berê serwîzad çû,qajê jî ew şopand. Di dema Asûrî,Medî û Ahameniyan de,qaj dara ku herî bêhtir hate resmdan,qozeya rojê weke nîgara herî berbiçav, ku heta B.Z. 330 salan Seray dixemilandin,ku dema tune bûna daristanên qaj li sedsalên P.Z. 3 ango 4'an rast tê.

Ev wêrankirina di rûberka rîvekî de, bi awayekî xwezayî avhewaya giştî û di behreya ziyana ku bikaribe were veberkirin a pergala erdê de, bandoreke neyînî û bi hêz afirandiye(Bnr.Avhewa û Baran).Wêrankirina ku di sedsalên 19 û 20'an de hate kirin jî, bi qasî ku ziyana ji serdemên kevnare û bi vir de mane bi giştî boçî bihêle mezin e.Pevrûkirinek

pêşnûmayî ku di navbera rewşa derdorê ya îroyîn û bîranînên gerokên Ewrûpayî de ku di sedsala borî de Kurdistan ziyaret kiribûn jî bodîneya guherîna neyînî ku di dewlemendiya rîvek û ajalên herêmê de qewimî, di çewaniya ku mirovan bitirsîne de ye.Tebeqeya jora erdê ya berdar ku ji rûberka rîvekî bêpar mabû, bi baranên biharê yên tund ,bi şepeyên ku bi şemitîna erdê ya zivistan û biharê re cih guhertibû re, bi awayekî cangizok dikişkişî û diçû,dibû sedema girtına rêyan û ziyan dida warên niştecihiyan.

Ev tebeqeya jorîn ya erdê î nirxdar ku diket torên çeman û tune dibû diçû,ne tenê berdariya xwezayê ya pêşeroja welêt,lê di heman demê de bendavên heyî jî bi rêjeyeke xeternak tije dike,nehêniya hîdrolîk a herêmêyî fereh jî tune dike(Bnr.Çavkaniyên xwezayî:Av).Bê goman ev wêrankirin tenê ne bi Kurdistanê bi sînor e; pergalên erdê yên herêmên cîran, a rastî Cîhan bi giştî,bi awayekî manend şopên wêrankirinên mirovan li ser xwe digerînin. Parastina rûberka rîvekî ango şerên demdirêj rewş bêhtir bed kirine. Di dema operesyonên leşkerî de, veguhestinên ekîbmentên leşkerî ên giran, bombebarandin û weke nêrîtên şewitandinê yên bi qestî, ji bo wêrankirina bi giştî ya derdora ku jixwe qirofek bû tevkarî kiriye.

FLORA Û FAÛNA

Di serdema kevnare de li Kurdistanê bi mêjereke têrkar darên weke berû, beruwa boçî,şambelot,merx,qaj,serwîzad,û mêwedarên kovî ku ji bo hebûna daristanan govantî kirine,xwe gihandine roja me ya îroyîn (Bnr. Derdor û Erdnasî).

Berû û beruwa boçî darên herî belavbûyî ku ji daristanên Zagrosan mane ne. Daristanên berûyî,ligel şambelotan ên kovî, mîna kivarika kovî ku dikare bi mêjereke pir were dîtin de,di nav cûreyên kivarikan ên ku xureka xizanan pêk tînın de,ên êpê bi nirx û pergalên erdê yên mengî ne. Wekî din li daristanan gelek mêwedarên weke tirî,gilyas,hirmî,bihok,tû,dirik,bindeq,behîv û fêkiyên bi qalik û bê qalik jî têne danhev.Herêm ji serdemên kevnare û bi vir de,bi dewlemendiya pircûretiya kulîlkan tê nasîn (Bnr.Çanda Gel).Dibe ku Kurdistan cihê kedîkirina kulîlk û rîvekên şîfadar ên mîna helale,simbil,pîvok,nêrgiz,û gelek rîvekên pîvazî mîna giyakitik û gulbiharê ye.Kulîlk û giyayên bîhnxweş ku bi têrî têne dîtin,çavkaniya bîhnên xweş ya berhemên şîrî ên kurd î navdare jî (Bnr. Cotemenî).Faûna dewlemendiya xwe bi ajalên ku hêjî pir têne dîtin ên weke hirçên reş û boz, gur,keftar,beraz,rovî,darbir,torîk,çîta,leopar,eylo,bet,kakol,legleg,barbarîk û kew weke gelek çûkên niştecih û koçber ,kûsiyên biçûk û mezin,marmarok û maran parastiye.

Bi van ve girêdayî di pergala çeman û ava şîrîn de, masiyên weke masîpank,masiyê deqsor û masiyê kor jî di nav de,di avên bin erdê û di germavan de zêdeyî çil cûre masî di avên van herêman de têne dîtin.Gelek cûreyên ajalan ên ku di kûzikên Kurd ên berê û di pişpişandinên Asûriyan de hatibûn resimandin li Kurdistanê êdî tune ne.

Li gorî jêmayiyên şûnwarnasî, devlok (Cûreyê loxodonta)ku heta B.Z. destpêka 1000 salê li zozanên Kurd hatine nêçîrkirin,jiyîna şêrê Îranê(Felis leo persica) heta destpêka sedsala borî tê zanîn. Parçeyekî keviran ku ji B.Z. bi 2000 salan mabû û li Guzanayê dima (Tell halat a ku bi jêmayiyên serdema berî dîrokê navdar (Bnr. Serdema berî dîrokê),bi awyekî eşkere hebûna hêştirme û beta mezin destnîşan dike. Beta mezin hê jî heye. Di dema nêçîrê de bi piranî ajalên mezin ên bi çiçik hatine girtin,û hin ji wan bi awayekî girseyî hatine tunekirin. Qralê Asûr Tighlat pileserê 1'emîn (B.Z. 1114-1076),di nivîstekên ku jiyana wî vedibêjin de,gotiye ku wî di serdemeke nêçîrê de çar dewarên kovî,deh devlok û 920 şêr kuştine.

Pilingê newala Çemê Dîcleyê (Felis tigrîs. Ajal navê xwe ,ji berdêla navê Çemê Dîcleyê yê bi zimanên Ewrûpayiyan standiye),tê gotin ku tenê heta demên dawî yên serdema

kevn jiya ne.Çavkaniya ajalan ku li bajarê Romayê di lîstikên nêçîrkirina Pilingan de dihatin nîşandan ev herêm e. Lê belê ya ku pilingên Kurdistanê ne pilingên rastbin jî pêkan e.
Evan bêhtir, dibe ku parsên ku hê jî li Kurdistanê dijîn lê hejmara wan roj bi roj kêm dibe jî bin. Navê ku yekem car hatiye bikaranîn navê tîger, ên ku ji xaka Kurdistanê tanîn û di lîstikên ajalan de dihatin bikaranîn, piştî ji holêrabûna ajalên manend, ji hêla Romayiyan ve hatiye parastin, bi dûv re jî ji bo pilingên rast ku ji Hazar-Kafkas anîn hatiye bikaranîn.

Hestiyên hin çûkên mezin ku çêdibî heye ku di ayînên olî de (Bnr.Êzdayetî) hatibin bikaranîn,ji tewqên jorîn ên şikeftên Çamî ku li bajarê Şanîdar-Zawî ya nîvenda Kurdistanê hatine derxistin, û 10800 salîbûyîna wan hatiye peyitandin in. Ev ji hestiyên sîqalka bi rih, sîqalka sor, eyloyê dûvik spî, eyloyê biçûk û heta ê mezin pêk hatine. Eyloyê latê ku jibo Keyaniya Eyûbî ya Kurd û Key Selahadîn peywira gelaleya nîşanê didît, û şavat ango beta mezin (Otis tarda),li cihên herêmê yên ku zêde tiştek nikare bigihêjê hêjmarek kêm hene. Gelek çûkên ku li derveyî van her du cûreyên çûkên mezin û pîroz dimînin, îro li Kurdistanê di rewşeke ji holêrabûnê de ne.Baskên van her du çûkên bimirês ên vekirî ji 2m û nîvan derbas dibe,û bi vî awayî jî sedema bikaranîna van her du çûkan di ayînên olî yên berê de tê fêmkirin.

DAWÎ